■ Ehmed Yasîn

■ Ebdulkerîm Yehîya Zêbarî

# Seroberê evroke



**Ehmed Yasîn Bendî**

Heke ji xodê ne tirsiya ba, dibît hizra xwe di hez kirna wê kiçê da kir ba.

* * *

Li ber derê mizgeftê destên xwe bilind kirin û kizgiriyokê gewriya wî girt, rûyên wî ji rondikan ter bûn.

* * *

Rîhên xwe buhostekê dirêj kirbûn, ezmanê xwe çiwar tiblan ji rîhên xwe dirêjtir lê kir bû, û kesê mayê xwe tê ne dikir.

* * *

Piştî biriyar derkeftî,gotê ezbenî kes cihê ten a girît û em hemi dê li mal rûnîn.

* * *

Mirovekê bê dîn û îman bû, li wê êvarê pê li hemi yasa ya dana û maçek li eniya wê kiça nû gehiştî da.

* * *

Bê namîsî, wextê hatiye mal û çavêt wî di sor, hemiya zanî ew qozulqurta di difnêt xwe danay.

* * *

Berî rondika dawiyê ji çavêt wî bikevît, lerzikekê lêva wî ya binî girt û çavêt wê niqiyan, neşiya bêjît ez hez jê dikem.

* * *

Ne kete eqlê wî, kir û ne kir çi care ne dîtin, paşî girnijî û wereqa spî kire di sindoqê da.

* * *